# Kengî bên nexweşxanê ji bo zarokbûnê

## When to Come to Hospital in Labour

Kurdish Kurmanji | July 2022

Ji kerema xwe berîya ku hûn ji malê derdikevin bi Servîsa zarokbûnê re an jî bi pîrika xwe re bikevin têkilîyê. Pîrik dê ji te re bibêje bê ka tu dê çi bikî û bersiva her pirsan bide.

### Ger hûn li benda pitika xwe ya yekem in

Heger hûn nêzî dîroka xwe ya dawî (37 hefte an jî zêdetir) bin, divê hûn werin nexweşxaneyê:

- Dema ku hûn êşên zarokbûnê yên bi rêk û pêk bikişînin ku her ku diçin bi hêztir dibin, nêzî hev dibin û ji serî heta dawîyê 60 çirkeyan dewam dikin. Divê herî kêm sanciyên te saetekê berdewam bikin. Êşên zarokbûnê dê ji bo piranîya jinan bi qasî sê-pênc deqîqeyan ji hev dûr bin.

### Yan jî

- Wexta ku avên te diqetin. Ev gava çenteyê avê yê li dora pitikê dişikê ye. Dibe ku tu hinekî bixapînî an jî ji nişka ve şileyek hebe. Dema ku avên we şikestin, danîna pedeke paqijî fikreke baş e. Pîrika te dema ku tu diçî nexweşxaneyê dê reng û bêhna şileyê kontrol bike..

### Yan jî

- Heger to xwînbûneke sivik hebe.e.

Heger hûn li benda pitika xwe ya yekemîn in û kêmtir e ku 37 hefte ducanî bin, eger nîşaneyên zarokçêbûnê ên weke êşa zarokçêbûnê, avên şikestî yan jî xwînbûn hebin divê hûn bi nexweşxaneyê re têkiliyê deynin.

### Heger berê we zarok çêkirine

Divê hûn şîretên li jor bişopînin ji bilî ku dema sanciyên we pênc heta heft deqîqeyan ji hev dûr bin divê hûn werin nexweşxaneyê.

### Heger hewcehîya min bi alîkarîyê hebe ku ez bi îngilîzî bipeyivim?

Heger hewcehîya we bi têgihiştina alîkarîyê an jî axaftina îngilîzî hebe tercûmanên profesyonel hene. Dibe ku endamekî we yê malbatê an jî hevalekî we hebe, lê belê divê hemû têkilîyên der barê lênêrîna we de bi rêya wergêrekî profesyonel bin. **Xizmetên wergêr belaş û nepenî ne.**

Heger yek ji we re neyê pêşnîyazkirin, mafê te ye ku hun wergêrekî bixwazim

n. Xebatkar dê ji bo we tercûmanekî ji we re bînin.

Ji bo ku hûn bi me re bikevin têkiliyê heger hewcehîya we bi wergêrekî hebe, ji kerema xwe li ser 131 450 li Servîsa Wergêrên Telefonê (TIS) bigerin.

**Local Contact (Tekiliya Herêmî)**

Person’s name (Nav): ____________________

Contact number (Telîfon): ____________________

Child, Youth & Family Services
301 Forbes Street, Darlinghurst, NSW 2010

Produced by South Eastern Sydney Local Health District
Translations funded by the Multicultural Health Service